

Dumahîk : Destlat û...

û rê ji gendelewê re jî fereh û kûrtir bike. Ji ber wê yekê jî, cîhan tev dizane, ku li hemî dewletan libergirtina gendelewê, ji koka xwe de, ne ustubariya dezgehên asayîşê ye, li bervajî wê, belkî ew hîmek in ji sedemên wê û rola wan di pirsên wek wê de pir gumandar e û diyar e, loma jî gereke asayîş destê xwe ji mijarê bikêşîne, bi dezgehên zagonî ve were girêdan û bibe karê dadgehan.

Lê tiştên herî bingehîn, divê azadî û demkrasî peyda bibe, saziyên komelgeha sîvîl û partiyên siyasî serbest û bi şeweyekî zagonî bixebitin û rola xwe bistînin. Eger dixwaziyêke îjdl bi çareserkirina pirsê gendelewê heye, divê ev hemî war, ligel serbestkirina ragihandinê, werin zelalkirin û azadkirin, ji bilî vê rêkê û wan pêdvîyên pêwîst, çi gotin û çi kar ji bo çareserkirina gendelewê û gelek pirsgerêkên dewlete û civaka Sûrî werin kirin yan gotin, dê bê encam bin û dê bibe ji rengê: «şorên pir.. bayê kur!!».


Baş xuya ye, ku ta roja îro, destlat li çareseriyên kokane û birdar ji pirsgerêka gendelewê re negere, ew dixwaze di rîya asayîşên xwe re xwe nêzîk wê pirsê giring bike. Lê pirsêke wek wê mezin ku gelek caran dawîya dewletan aniye, bi karên biçûk û rast û rewşa çareser nabe, ew ne rîya çareseriyê ye, ji ber em tev dizanin ku sedema gendelewê ya bingehîn, ne di kesayetiya karmendan de ye, ew li rêza pêşîn di zagon û çawahiya destlatê û mejiyê rêberên wê de ye. Wek tê gotin masî ji serî de digemire, destlat û sazûman jî ji hiş, raman, siyaset û biryarên ne durust de digemirin û gendelewê dibin.

Loma jî pakirin û malana dewletan jî, mina ya pêplûkan e, ji jêr de natên şuştin, ew jî ji pêplûka tewir jor de tê şuştin, yan jî hîç pak nebe.

Birastî, dilê mirovê Sûrî pir dişwite, dema dibîse ku navê welatê wî di warê gendelewê de, di nav pileyên herî xirab de ye li cîhanê. Bêguman, ji vê rewşa xirab de, sazûman û destlat berpirsiyar û gunehbar e.

Nameyeka sersaxiyê

Li xerîbiyê , 7-ê Çiriya paşîn 2009 an , di nexweşxaneke Stokholmê – Swêd , di bin kartêkirina bûyereke bi êş de , dilê têkoşerê Kurd ê navdar ê ku bi navê **kek Lezgîn** dihate naskirin , **Zeyn - Elabidîn Ozalp (Şêx Zeynî)** rawestiya û ji vê dunyayê koç barkir .



Rojnameyên Swêdî û hinde malperên bi zimanê kurdî , bi êş û mixwabinî , nûçe dane belavkirin . Li nusêbîn , Cizîr , Diyarbekir û seranserî Kurdistanê , digel rewşenbîr û siyasetvanên Kurd ên ku li Swêd û Awropa dijîn deng vedabû û ciyê berketîbûna xelkê bû.

Lezgîn (Şêx Zeynî) bi dil û can li dirêjahiya nêzî Çil salî ji temenê xwe , di têkoşîna li beramber nijadperestiyê û siyaseta înkarkirina hebûna gelê Kurd de dixebitî û li ber xwe dida . Û ji bona pirsê demokrasiyê , mafên mirovan , azadî û wekheviya gelan , çalakvanekî dilsoz , xwedî nêrîn û helwest bû . Di girtîgehan de û li hember dadgehên Turkiyê , bi serbilindî û bê dudilî , li zimanê xwe yê dê dibû xwedî , mirovekî mirovhez bû

Bila serê dost û hevalên Şêx Zeynî sax be , xwedî , meriv û malbata rehmetî xweş bin . Çûna kek Lezgîn - Şêx Zeynî – xisara me hemiyar bû .

Nivîsgeha rêzanî ya Parta Yekîtiya demokrat a Kurd li Sûriyê(Yekîti)

9.11.2009